ji Tirkîyê. КОМКАР (Komeleya Karkeran) a ku ji hêla van hatibû sazkerin, diceriband ku Kurdan li ser berjewendiyên wan ên bijarte organîze bike û bikaranîna Kurdî teşwîq bike. Bi vî awayî cara yekemîn Komkarê jibo mafê perwerdeyî ya Kurdî, wek zimanê zikmakî li şuna Tirkî, ket tewgerê (ku li dibistanan li Hollandê û li Almanyê di çerçewa ‘ziman û çand a xwe’ de dihat pêşkeşkirin). Vê saziyê hin pirtûk û bultenekî jî, ya ku li pey hev derdiket, diweşand. Di destpêkê de ew bi Tirkî û Almanî bû, lê ji salên 80’an vir ve jî herçî çû bi Kurdî derket.

Salên 80’an dema pêşketina nelibendêbûyî ya Kurmancî bûn, pir îronîk e ku ew pêşketin li dû tadayiya xurt ya li ser nasnameya Kurd li Tirkîyê derket holê. Fermandarên leşkerê di sala 1980’ê de hikûmet ji kar xisti bû, ku yek ji armanca wan berîgirtina tewgera Kurdan bû, ku di dehsala çûyî de di nav xwendewan û rewşenbîrên Kurdan de gêş bû bû. Gelek rewşenbîrên Kurd ji Tirkîyê rewiya bûn û ji dû gerek dirêj a li rojhilata navîn, di dawiyê de li welatên wek Swêd û Almanyê cih û war bûn. Eger ew li Tirkîyê bimiyana, ewana belkî jî ê bi Tirkî binivîsiyana, lê jiber sebebên siyasî wana li sirgûniyê pêşanî dan zimanê Kurdî. Gelek kovarên Kurdî yên politîk û çandî û peyderpey pirtûk jî hatin weşandin; çîrokên gelerî, wergerên wêjaya Ewrûpî, dîwan û dû van kurteçîrok, meqale û romanên bi Kurdî jî hatin weşandin. Babetên nûjenên ku mirov heta demekî kin tenê bi Tirkî li ser difikiriya û dipeyîviya – Kurdî tenê di nav mal û gund de dihat bikaranîn – nika mirov fêr bû ku marama xwe êdî bi Kurdî jî bibêje. Di va sala 2002 de Kurmancî êdî zimanê ku mirov pê dikare li ser hemû babetan bi awayekî fehmbar û hûrgilî biaxife. Enstîtûya Kurdî ya Parîsê, ya ku di 1983 de ji hêla rewşenbîrên Kurdên sirgûniyê ve hati bû ava kirin, forûmek hevdiîtina nivîskarên Kurd koordîne dike, ku ew standardîzekirina bêjeyên bo têgînên spesîfîk ji xwere armanc digre. Ji Ewrûpayê bi rewşenbîr û nivîskarên Kurdên Ermenistan (-a Sovyetê)’re danûstandin danîn jî êsantir bû, ku li wir ji berê de lipeyhev berhemên wêjeyiyên Kurmancî çê bû bûn, ku ewana tesîrek bibar li ser Kurdên ‘Tirk’ yên Ewrûpaya Rojava kir.

Ji dû jiholêrakirina qedexeya weşanên Kurdî di sala 1991 de ew geşbûna çandîya Kurmancî berê xwe da Tirkîyê jî, qet nebe berê xwe da bajarên mezinên li rojavaya Tirkîyê, ku li wir komek girîng ya Kurdên perwerdebûyî dijîyan. (Ji ber ku di Kurdistanê bi xwe de rewşa awerte hebû û livînên çandî hema hema nemimkun bû). Pirtûkên ku cara yekem li Ewrûpayê çap bû bûn, li Tirkîyê carekî din hatin weşandin. Hinek weşanvanan kar û barên xwe ji Stockholmê birin Stem-

bol û Ankarayê. Kesên ku li derweyî mala xwe jî Kurdî bikar aniyan li Tirkiyê jî zêde bû; bêje û metelokên ku di destpêke de di nav komên piçûka rewşenbîran de çê bû bûn, peyderpey ketin nav çînen frehên Kurmancîxifan.

Ferhengên Kurdî

Di behsa Kurmancî de em karin bêjin ku ferheng ne tenê pêşdeçûna zimên û serguzešta axaftvanên Kurmancî nîşan didin, lê wan, di beşa duwemîn a sedsala bîstan de, di têkoşîna qabûlkirina çanda Kurdî de para xwe jî girtin. Ji ser ferhengên pêşîn gelek dem derbas bûye. Bi texmînî gerokê Tirkan Evliya Çelebî, di nîva sedsala 17' min de, kesê yekemîn bû ku lîsteyek peyivên Kurmancî amade kiri bû.⁴ Ji dû sedsalekî zêdetir mîsyonerek Îtaliyê ku demekî dirêj di Bakûrê-Irakê ye îroyîn de kar kiri bû, rêzimana yekemîna Kurdî, bi lîsteyek fireha Kurmanciya wê derê (yanê bi Badînî),⁵ nivîsî. Di saya mîsyoner û şandoxên ku çûne heremê de, herçiqas hinik be jî, hîn çend nivîs li ser zaravayên Kurdî ji mera mane. Kurdî jibo wan zimanek giring bû, jiber ku zimanê zikmakîyê komek ji Ermenî û Suryaniyên ortodoksên heremê ne Ermenîkî û ne jî Suryanîkî lê Kurmancî bû. Manîdar e ku nivîsa yekemîna Kurdiya çapkirî wergerek Încîlê bû, ku jibo Ermeniyên file yên Kurdistanê bû.

Ji bilî mîsyoneran eleqaya hinek balyoz û memurên Osmaniyan jî Kurdî anî bû ber çavan; jibo berjewendiya wan jî bû ku ewana danûstandin bi Kurdên niştecih û Kurdîaxifên herêmê ve daynin. Alexandre Jabayê ku di dora nivê sedsala 19' mîn de balyozê Rusyayê Erziromê bû, ku ew li wir Kurmancî fêr bû bû û gelek destnivîsên Kurdiyên granbiha berhev kiri bû, di sala 1879 de wî ferhenga yekemîna berfireha vî zimanî weşand, ku têda zêdeyî 10 000 bêje hebûn.⁶ Berbi dawîya sedsala 19' mîn li Stembolê ferhenga békêmasiya Kurdî-Erebî ya Yusuf Ziyauddîn Paşa, yê ku memurekî nûjenîxwazê bi eslê xwe Filistinî bû û wî demekî dirêj li Bedlîsê walîti kiri bû, çap bû.⁷ Ew du ferhengan ji xwe re devokên cûrbecûr yên Kurmancî bingeh girti bûn. Ew ferhengan li dû zêdeyî sadsalekî hîn qîymeta xwe wînda nekirin, jiber neteweperweriya Kurdî eleqeyak zanistî jî jibo Kurdî zede bû bû, û bi biryarekî di cîh de ew careke din çap bûn.

Di nîva sedsala bîstan de ji hêla kurdoloxên Sovyetê ve çend ferhengên gelek berfireh, yên ku tu zarava ji xwe re bingeh negirti bûn, hati bûn weşiyar: Rusî-

Kurdî ji hêla I. O. Farîzov ve û Kurdî-Rusî ji hêla Qanatê Kurdo (K. K. Kurdoev) ve. Di ew ferhengan de li gorî rêza jorîn 30 000 û 34 000 bêje hebûn, ku ji zaravayên cûrbecûr hati bûn berhev kirin.⁸ Ferhengek gelek mutawazî ya Kurdî-Fransî-Înglîzî jî ji hela Joyce Blau ve, di bin çavdêriya Kamiran Bedîrxan de, hati bû amede kirin.⁹ Ew ferheng demekî drêj jibo Ewrûpiyên Rojavayî wasiteya bikarbara yekta jibo Kurmanciya nûjen bû. Zimên xwe ewqas bilez pêşde bir bû, ku ew ferheng bo xwandina nivîsên kovarên nûjen êdî bikar nedihat.

Ferhengek Kurdî-Tirkî ya nadîde jî ya nivîskar rojnamevan Musa Anter e, ku wî ew di sala 1967 de li Stembolê weşiya bû.¹⁰ Anter va karê xwe – ji xwe ew lîsteyek dirêja bêjeyan bû – çend sal berê çapê, gava ku jiber karên xwe yê neteweperwerî di girtigehê de bû, amade kiri bû. Di pêşgotinê de ew dinivîse ku wî bi vê ferhengê xwe ve xwastiye alîkariya rêzgirtina dualî di nav gelên Tirkîyê de bike. Bi rastî pêdivîtiya wî ya grîngtir, herhal ihtiyaca nîşandayîna zimanek serbixwebûyîna Kurdî bû, bi dewlemendiya gencîneya peyvên, û neku zaraveyek xwerabûyî ya Tirkî ye weke ku îdeolojiya fermî dibêje. Di dehsala bê de ewê di hemû çalakîyên çandîyên Kurdî de wek pêdivîtiyek girîng bimîna. Ji ber ku desthilatdarên Tirk ji aliyekî ve tadayî li çanda Kurdî dikirin û ji aliyekî ve jî nedipêjêrandin ku tiştê weha wek zimanê Kurdî heye, jibo rewşenbîrên Kurdan giring bû ku ew ispat bikin, ku zimanê Kurdî di rastiye de zimanek serbixwe, dewlemend û ji Tirkî pir cûda ye, û bi alî bêjeyan ve jî dewlemend e û wêjeyek wê ya kevnar heye.

Wê wateyek zêde ya siyasî jî dida ferhengan. Ferhengên ku hebûn hatin wergerandin Tirkî, û bi armanca lêbandorkirina reya giştî ya Tirkîyê hatin weşandin. Lîsteya bejeyan ya Joyce Blau ji hêla siyasetvanê Kurd Dr. Şivan (navê kod yê Sait Kırmızıtoprak) ve hat sererast kirin û ji dû mirina wî hat çap kirin û bi dizî hat belav kirin.¹¹ Demek kin ji dû vê wergera Tirkî ya ferhenga Yusuf Ziyauddin li Stembolê, û du vê jî ferhenga Rusî-Kurdî ya Farîzov weşiya.¹² Ji bilî di têkoşîna siyasî de wek çek bikaranîna van ferhengan, ji hela Kurdên ku bi Tirkî perwerde bûne, jibo dewlemendkirina gencîneya peyvên xwe û bikaranîna bêjeyên Kurdî ‘pêti’ li şuna bêjeyên bi esl Tirkî jî ew pir hatin xebitandin.

Li dû tiştên ku li jor, li ser geşbûna wêjeya Kurmanciya li sirgûniyê, hatin nîşandan, mirov nedieci bîne ku ferhengên nu yê girîngtirîn ji hêla Kurdên li Ewrûpaya Rojava ve hatine amade kirin, ku ew bi pêkhatina dîasporayek organîzebûyîya Kurdan û bi hatina rojnamevaniya Kurd ve girêdayî ye. Ferhenga ye-

kemîna Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî di sala 1987 de li Den Haagê weşiya û li dû liberalizebûyîna Tirkîyê li Stembolê carekî din hat çap kirin.¹³ Nivîskarê wê D. Îzolî (navê wî yê fermî: Hüseyin Yıldız), yek ji karkerên koçberên Kurdên pêşîn li Holendê bû û wî bi salan qursên alfebê û rêzimanê da heval û cîwanên nifşa duwemîn. Karê wî, lêpîrsîniya gelek Kurdên din û bi sistematîk jiçavderbaskirana weşanên Kurdiyên ku li derweyî welêt hatine weşiyên, ji xwe re bingeh digire. Va fergenga, Kurdiya nivîsî ji ferhengên berê bêtir nîşan dide. Ji demek kin vir ve va Ferhenga, bo beşa Tirkî-Kurdî ji hêla ferhenga Mehmet Tanrikulu¹⁴ ya ku li Swêdê weşiya ve, reqabetek dibîne.

Li Almanyayê jî ferhengek gelek berfireh, ya Kurmancî-Almanî ji destê zimanzan û helbestvanê Kurd Feryad Fazil Omar weşiya.¹⁵ Jibo xwendina nivîsên wêjeyîyên kevn ew fergengek bêkemasî ye, lê bo nivîsên nûjen hewqas bikar nê. Nivîskarê wê, bi xwe Soranîaxîfek ji Iraqê, di ser de pir bejeyên zaravaya xwe jî xistiye ferhengê. Di ferhenga girîngtirîna Kurmancî-Ingilîzî ya Baran Rizgar de jî kemasîyên hanê hene: tê de gelek bêjeyên ku bi giştî nayên bikaranîn hene û yên ku bikar tên jî nînin.¹⁶ Zimanzanê Amerîkî Michael Chyet, yê ku bi dîasporaya Kurd ve di têkiliyek tund de ye û piraniya zimanên gelên cîranên Kurdan jî dizane, salane li ser ferhengek dixebite ku ewa ferhenga qetî ya Kurmancî-Ingilîzî bibe. Qopyayên nusxeya miweqeta vê karê hewldar di destên hevkarên de digere, lê jiber perfeksiyonîzma Chyets'ê weşandina vê serberhemê ê hin demekî bajo.

Ferhenga Kurdî-Holendî ya ku birayên Qîlorî amede kirine, ku nika di destê we de ye, di hevberkîkirina bi ferhengên ku berê çap bûne de çêtir derdikeve. Ew ne tenê ji karên hindikên Holendî yên ku heta niha amadene baştir e, ji bo nivîsên nûjenên Kurdî jî ji ferheng û lîsteyên bejeyan yên Ingilîzî, Almanî, Fransî û Swêdî, yên ku vê gavê hene, hîn bêtir bikar tê. Bo kesên ku Kurdî dixwazin hîn bibin ew ferheng alîkariyekî pêwîst e, û ewê jibo Kurdên ku Holandî bêtir dixwazin ferbin jî ê xwaş bikar bê.

Prof. dr. Martin van Bruinessen
Beşa Ziman û Çanda Rojhilatî ya
Zanîngeha Utrechtê

Jêrenot

- 1 Servet Mutlu, 'Ethnic Kurds in Turkey: a demographic study', *International Journal of Middle East Studies* 28 (1996), 517-541.
- 2 Amir Hassanpour, *Nationalism and language in Kurdistan, 1918-1985*. San Francisco: Mellen Research University Press, 1992.
- 3 Ew, nivîskarên wêjeyî Erebo Şemo, Eskerê Boyik, folklorvan û dîroknivîsên çandê Ordîxan û Celîlê Celîl, û zimanzan Qanatê Kurdo ne.
- 4 Binêre: Martin van Bruinessen, 'Les Kurdes et leur langue au xviième siècle: notes d'Evliya Çelebi sur les dialectes kurdes', *Studia Kurdica* (Paris) No. 1-5 (1988), 13-34.
- 5 Maurizio Garzoni, *Grammatica e vocabulario della lingua Kurda*. Roma: Stamparia della Sacra Congregazione di Propaganda Fide, 1787.
- 6 Alexandre Jaba, *Dictionnaire kurde-français*. St-Petersbourg: Académie Impériale des Sciences, 1879. Ji hêla Biblio Verlag ve li Osnabrückê di sala 1975 de cardin çap bû. Berê wê jî Jaba hîn nivîsên komkirî li ser eşîr, wêje û folklorê Kurdan, bi Kurdî û bi wergera wana bi Fransî weşiya bû: Alexandre Jaba, *Recueil de notices et de récits kourdes servant à la connaissance de la langue, de la littérature et des tribus du Kourdistan. Textes kourdes réunis, publiés, traduits et annotés*. St-Petersbourg: Académie Impériale des Sciences, 1860.
- 7 Yûsuf Diyâ'uddîn al-Khâlîdî, *Al-hadiyya al-hamîdiyya fî'l-lughâ al-kurdiyya*. Istanbul, 1310/ 1892-3. Bi pêşgotinekî Mohammed Mokri ve ji hêla Librairie du Liban li Beyrûtê di sala 1975 de cardin çap bû.
- 8 I.O. Farizov, *Russko-Kurdskij slovar'*. Moskva: Gosudarstvennoe Izdatel'stvo Inostrannyx i Natsional'nyx Slovar'ej, 1957; K.K. Kurdoev, *Kurdsko-Russkij slovar'*. Moskva: Gosudarstvennoe Izdatel'stvo Inostean'nyx i Natsional'nyx Slovar'ej, 1960.
- 9 Joyce Blau, *Dictionnaire kurde Kurdish dictionary*. Bruxelles: Centre pour l'Étude des Problèmes du Monde Musulman Contemporain, 1965.
- 10 Musa Anter, *Ferhenga Khurdî - Tirkî*. Istanbul: Yeni Matbaa, 1967.
- 11 Joyce Blau, *Ferheng, Kurdi û Turki*. Z.pl. (Antwerpen?): Weşanên Şivan, 1975.
- 12 Yusuf Ziyaeddin Paşa, *Kürtçe-Türkçe sözlük. Yeniden düzenleyen Mehmet Emin Bozarslan*. Istanbul: Çıra Yayınları, 1978; İ.O. Farizov, *Türkçe-Kürtçe sözlük*. Ankara: Öz-Ge Yayınları, 1994.
- 13 D. Izoli, *Ferheng, Kurdi-Tirkî, Türkçe-Kürtçe*. Den Haag: Komeley Xwendikarani Kurd le Ewropa beşa Holanda. Nederland, 1987. Çapa nu ya jiçavderbaskirî Istanbul: Deng Yayinlari, 1992.
- 14 Mehmet Tanrikulu, *Türkçe-Kürtçe sözlük Ferhenga Tirkî-Kurdî (Kurmançî)*. Stockholm: Podium, 1999. Li Tirkiyê herwiha ferhengê Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî ya nivîskar Torî'yê ku li Belçîqa dijî (Istanbul: Koral, 1992) û ferhenga Tirkî-Kurdî ya Fetullah Kakioglu jî (Istanbul: Sosyal Yayınları, 1992) weşiyen.
- 15 Feryad Fazil Omar, *Kurdisch-deutsches Wörterbuch (Kurmançî)*. Berlin: Verlag für Wissenschaft und Bildung, 1992.
- 16 Baran Rizgar, *Dictionary/Ferheng, Kurdish-English, English-Kurdish*. London: weşana di bin çavderiya xwede, 1992.

Koerdisch alfabet / Alfabe kurdî

A	B	C	Ç	D	
a	b	c	ç	d	
E	Ê	F	G	H	
e	ê	f	g	h	
I	Î	J	K	L	
i	î	j	k	l	
M	N	O	P	Q	
m	n	o	p	q	
R	S	Ş	T	U	Û
r	s	ş	t	u	û
V	W	X	Y	Z	
v	w	x	y	z	

Gebruiksaanwijzing

Het Koerdische alfabet bestaat uit 31 letters, die hiertegenover staan. In het Koerdisch zijn *ç, ê, î, ş* en *û* aparte letters, die in volgorde na respectievelijk *c, e, i, s* en *u* komen.

Alle Koerdische trefwoorden zijn vet gedrukt en staan in volgorde volgens het Koerdische alfabet.

Nederlandse tekst die tussen haakjes staat is cursief gezet, Koerdische tekst tussen haakjes is niet-cursief.

Als lemma's zijn onderverdeeld, worden bij homoniemen (gelijkluidende woorden met aparte betekenissen) vette Romeinse cijfers gebruikt, waarbij elk homoniem op een nieuwe regel begint en inspringt. Bij verschillende vertalingen van een trefwoord worden vette Arabische cijfers gebruikt.

- fêz** **I** *zn.* **1.** (gasîn) het plein, de plek **2.** (hêl) de kant, de zijde
II *zn.* **1.** (xirûr) de trots **2.** (kîbîr) de hoogmoed, de arrogantie
III *bijw.* (jor) boven
ronahî **1.** *zn.* het licht, de helderheid **2.** *bn.* licht, belicht, helder

Na het vette lemma volgt cursief een afkorting van de Nederlandse woordsoort.

Als er meerdere vertalingen zijn die alle tot dezelfde woordsoort behoren, wordt de woordsoort direct na het lemma geplaatst; als de vertalingen verschillende woordsoorten betreft, staat de afkorting van de woordsoort na het vette cijfer.

Als een woord tot meerdere woordsoorten behoort, worden de woordsoorten gescheiden door een komma.

Na de woordsoort volgt de vertaling. (De afkortingen staan op blz. 32.)

Bij Nederlandse zelfstandige naamwoorden worden de lidwoorden gegeven.

firîngêh *zn.* het vliegveld, de luchthaven
fir kirin *ww.* 1. nippen 2. slorpen, slurpen
fitne 1. *zn.* de onvrede, de tweedracht, de onenigheid 2. *bn.*
 onruststokend, onrustzaaiend
mecanî *bn., bijw.* gratis
mecazî *bn., bijw.* figuurlijk, overdrachtelijk

Dit woordenboek is voornamelijk in het Kurmanci-dialect geschreven. Daarnaast zijn er ook woorden van het Zazaki- (Dimili-) en Sorani-dialect opgenomen. Deze zijn voorzien van de afkorting Z. of S.

dengûbas *zn., S.* het nieuws, het journaal, de nieuwsberichten
lacik *zn., Z.* 1. het zoontje 2. het jongetje

Als een Koerdisch woord vertaald kan worden met een mannelijke en een vrouwelijke vorm, wordt dit tussen haakjes cursief aangegeven met *m.* voor mannelijk en *v.* voor vrouwelijk.

fêrmend *zn. (m.)* de onderwijzer, (*v.*) de onderwijzeres, (*m.*)
 de leraar, (*v.*) de lerares

Synoniemen van lemma's worden na de afkortingen vermeld en staan tussen haakjes.

kone *bn.* (*kevn*) oud

Verbuigingen van werkwoorden zijn tussen haakjes vermeld in de vorm van de gebiedende wijs enkelvoud en de tegenwoordige tijd. In sommige gevallen wordt alleen de gebiedende wijs vermeld.

patin *ww.* (*dipeje, bipeje*) koken, bakken **nan patin** brood
 bakken
nuhurandin *ww.* (*binuhurîne*) kermen, kreunen, jammeren

Bij werkwoorden worden naast synoniemen ook verbuigingen gegeven. In dit geval staat na de verbuiging tussen haakjes het synoniem ook tussen haakjes.

nivîn 1. *ww.* (binive) (raketin) slapen, naar bed gaan
2. *zn.* (cil) het bed

Bij meerdere vertalingen staan de synoniemen na de Arabische cijfers.

rakêşandin *ww.* (radikêşe, rakêşe) 1. (kişandin) trekken
2. (tamijandin) aantrekken

Als er als vertaling een omschrijving is gegeven, wordt dit aangegeven door □.

bewreşînk *zn. med., S.* □ een (*de*) huidziekte
hoqe *zn.* □ het gewicht van 1283 gram

Vertalingen die uit meerdere woorden bestaan – waardoor geen woordsoort kan worden aangegeven – zijn tussen rechte haakjes geplaatst.

berkel [bijna kokend], [tegen de kook aan]
ewledar *bn.* veilig, [te vertrouwen]

Met een ► wordt naar een meer frequent lemma verwezen.

hêtûn *zn.* ► êtûn

De opgenomen voorbeeldzinnen zijn tevens bedoeld om betekenisverschillen aan te duiden. De Koerdische voorbeelden zijn vet gedrukt.

jiyîn *ww.* (dijî, bijî) 1. leven 2. wonen **ez li Den Haagê**
dijîm ik woon in Den Haag
kê *vr.vnw.* wie, wiens **Kê te re got?** Wie heeft jou dat verteld? **Kê li wî xist?** Wie heeft hem geslagen? **Ew ya kê bu?** Van wie was dat? **Ew bavê kê ye?** Wiens vader is hij?

In sommige gevallen zijn de voorbeeldzinnen tevens gezegdes of spreekwoorden. In zo'n geval zijn de voorbeelden niet letterlijk vertaald, maar met overeenkomstige spreekwoorden of gezegdes. In dit geval staat het teken ◇ voor de vertaling.

enîşk *zn.* 1. *anat.* de elleboog 2. *anat.* (enîşkê borî/lûle) de elleboog 3. *wisk.* de rechthoek **enîşk dan** ◇ iemand de rug toekeren, geen contact meer willen hebben

Alfabe kurdî

A	B	C	Ç	D	
a	b	c	ç	d	
E	Ê	F	G	H	
e	ê	f	g	h	
I	Î	J	K	L	
i	î	j	k	l	
M	N	O	P	Q	
m	n	o	p	q	
R	S	Ş	T	U	Û
r	s	ş	t	u	û
V	W	X	Y	Z	
v	w	x	y	z	

Rênîşa bikaranîne

Alfebeya Kurdî ji 31 tîpan pêk tê, ku ew di rûpela beramberî vir de ne. Di kurdî de *ç, ê, î, ş, û* tîpên cûdane û di rizê de li dû *c, e, i, s, u* yê tîn.

Hemû bêjeyên Kurdî qelew (reş) çap bûne û li gorî rêza alfebeya Kurdî hatine rêz kirin.

Nivîsên Holendî yên ku di navbera hîvokan de ne îtalîk (xwar), nivîsên Kurdî yên ku di nav hîvokan de ne, rast hatine danîn.

Eger bend bîn beş kirin, li ba hevmaneyan (bêjeyên hevdeng lê mane cuda), hejmarên qelewên Roma'yî hatina bikar anîn, li wir her hevmane bi rêzekî nu ve, piçekî di hundir de dest pê dike. Eger bêjaya serrêzê ji pirtir menayan pêk bê, vê gavê bi hejmarên Erebi ve ji hev tîn cûda kirin.

fêz I *zn.* 1. (gasîn) het plein, de plek 2. (hêl) de kant, de zijde

II *zn.* 1. (xirûr) de trots 2. (kîbîr) de hoogmoed, de arrogantie

III *bijw.* (jor) boven

ronahî 1. *zn.* het licht, de helderheid 2. *bn.* licht, belicht, helder

Ji dû benda qelew kurtebêjeyek îtalîk (xwar), ku ew bêjeya Holendî çî cûre ye nîşan dide, tê.

Eger pirtir wergerên bêjeyek hebin, ku hemû yekcûre bin, wêcar kurtebêje dîrekt li dû bendê hatiye danîn; eger wergerê bêjeyê cûrbecûr bin, wêcar kurtebêje li du hejmara qelew tê.

Eger bêjeyek ji pirtir cûreyan pêk bê, kurtebêjeyên ku cûrehiyan nîşan didin bi bîhnokê ve ji hev tîn cûda kirin.

Li dû kurtebêjeyê, wergera bendê tê. (Hemû kurtebêje di rûpela yanzdehê de ne.)

Li pêş navên Holendî pêşker (harfî tarîf) hatine danîn.

firîngeh *zn.* het vliegveld, de luchthaven
fir kirin *ww.* 1. nippen 2. slorpen, slurpen
fitne 1. *zn.* de onvrede, de tweedracht, de onenigheid 2. *bn.*
onruststokend, onrustzaaiend
mecanî *bn., bijw.* gratis
mecazî *bn., bijw.* figuurlijk, overdrachtelijk

Va ferhenga nemaze Kurmancî ji xwere bingeh girtiye. Lê bêjeyên Zazakî û Soranî jî tê de hene. Ew bêje bi kurtebêjeyên Z. yan S. ve hatine nîşan dan.

dengûbas *zn., S.* het nieuws, het journaal, de nieuwsberichten
lacik *zn., Z.* 1. het zoontje 2. het jongetje

Ger bêjeyekî Kurdî karibe li Holendi nêr û mê bê wergerandin ew di nav hîvokan de îtalîk hatiye nivisîn ku *m.* bo nêr û *v.* bo mê ye.

fêrmend *zn. (m.)* de onderwijzer, (*v.*) de onderwijzeres, (*m.*)
de leraar, (*v.*) de lerares

Hevmaneyên benda li dû kurtebêjeyan hatine danîn û di nav hîvokan de ne.

kone *bn. (kevn)* oud

Tewandinên lêkeran di nav hîvokan de ne, ku ew raweya fermaniya yekhejmar û dema niha ne. Hinek caran bes raweya fermaniya yekhejmar hatiye beyan kirin.

patin *ww.* (dipeje, bipeje) koken, bakken **nan patin** brood
bakken
nuhurandin *ww.* (binuhurîne) kermen, kreunen, jammeren

Li ba lêkeran, ji bilî hevmaneyan, tewandin ji hatiye dayîn. Vêcar jî di pêşîyê de tewandin, dû vê jî hevmane di nav hîvokan de ne.

nivîn 1. *ww.* (binive) (raketin) slapen, naar bed gaan
2. *zn.* (cil) het bed

Ger pirtir wergerên bêjeyek hebin, vêcar hevnameyan li dû hejmarên Erebi tînen.

rakêşandin *ww.* (radikêşe, rakêşe) **1.** (kişandin) trekken
2. (tamijandin) aantrekken

Eger werger rawe be, ew bi □ ve hatiye nîşan kirin.

bewreşînk *zn. med., S.* □ een (*de*) huidziekte
hoqe *zn.* □ het gewicht van 1283 gram

Wergerên ku ji pirtir bêjeyan pêk tên – ku cûreya bêjeyê nikaribe bê dayîn – di nav goşekevanek de ne.

berkel [bijna kokend], [tegen de kook aan]
ewledar *bn.* veilig, [te vertrouwen]

Benda ku pirtir tê xebitîn bi nîşandeka ► ve tê îşaret kirin.

hêtûn *zn.* ► êtûn

Hevokên ku wek mînak hatine dayîn hem jî jibo nîşandayîna cûdahiya wateyan e. Hevoken mînak yên Kurdî **qelew** hatine nivîsandin.

jiyîn *ww.* (dijî, bijî) **1.** leven **2.** wonen **ez li Den Haagê**
dijîm ik woon in Den Haag
kê *vr.vnw.* wie, wiens **Kê te re got?** Wie heeft jou dat verteld? **Kê li wî xist?** Wie heeft hem geslagen? **Ew ya kê bu?** Van wie was dat? **Ew bavê kê ye?** Wiens vader is hij?

Hinek caran hevokên mînak biwêj yan jî gotinên pêşiyên in. Wergerandina van biwêj û gotinên pêşiyên bi biwêj û gotinên pêşiyên Holendi ve hatine kirin. Vê car jî nîşandeka ◇ li pêşiyê hevoka Holendî hatiye danîn.

enîşk *zn. 1. anat.* de elleboog **2. anat.** (enîşkê borî/lûle) de elleboog **3. wisk.** de rechthoek **enîşk dan** ◇ iemand de rug toekeren, geen contact meer willen hebben

Bibliografie / Çavkanî

- Sahir Adsız, *Nederlandse en Turkse zegswijzen*, Het Spectrum, Utrecht 1992
- Amindarov, Aziz, *Kurdish-English / English-Kurdish Dictionary*, Hippocrene Books, New York 1994
- J. Blau, *Kürtçe-Türkçe-Fransızca-İngilizce Sözlük*, Sosyal Yayınlar, İstanbul 1991
- K. ten Bruggencate, *Engels Woordenboek Eerste Deel Engels-Nederlands*, Wolters Uitgevers, Groningen 1939
- Ahmet Cengiz Çamlıbel, *İdyomên Kurdî*, Weşanên Deng, İstanbul 1997
- Mihemed Dehşîwar, *Mizgîn Ferhengoka Zarokan a Bi Wêne*, Weşanxaneya Newroz, Stockholm 1995
- Emîrxan, *Wörterbuch Kurdisch-Deutsch*, Max Hueber Verlag, Ismaning, 1992
- D. Faber e.a., *Het schoolwoordenboek: Nederlandse woordenschat voor de jeugd*, Jacob Dijkstra Educatieve Uitgeverij, Groningen
- Farizov, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Özge Yayınları, Ankara 1994
- I. van Gelderen, *Duits-Nederlands Woordenboek*, J. B. Wolters, Groningen 1959
- C. R. C. Herckenrath, A. Dory, *Wolters' Handwoordenboek Frans-Nederlands*, Wolters' Woordenboeken, Utrecht 1988
- M. Huijgen, M. Verburg, *Van Dale basiswoordenboek van de Nederlandse taal*, Educatieve Uitgeverij, 1987
- Institut Kurde De Paris, *Kurmançî (hejmar 1-20)*, Wesanên Apec, Stockholm 1999
- Instituut voor Nederlandse Lexicologie, *Woordenlijst Nederlandse Taal*, Sdu/Standaard, Den Haag/Antwerpen 1997
- D. Îzolî, *Ferheng Kurdî-Tirkî / Türkçe-Kürtçe*, Komeley Xwêndikaranî Kurd Le Ewropa, Den Haag 1987
- D. Îzolî, *Ferheng Kurdî-Tirkî / Türkçe-Kürtçe*, Deng Yayınları, İstanbul 1992
- Fetullah Kakioğlu, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Sosyal Yayınlar, İstanbul 1992
- Mehmet Kiriş, *Nederlands-Turks woordenboek*, Uitgeverij Lale, Nijmegen 1988
- Mehmet Kiriş, *Turks-Nederlands Woordenboek*, Etnicom, Ridderkerk 1992
- Mehmet Kiriş, *Uitdrukkingen- en spreekwoordenboek Nederlands-Turks / Turks-Nederlands*, Etnicom, Nijmegen 1992
- C. J. van der Klauw, G. J. van Oordt, *Technische termen*, E. J. Brill, Leiden 1968
- M. J. Koenen, J. B. Drewes, *Verklarend handwoordenboek der Nederlandse taal*, Wolters-Noordhoff, Groningen 1985

- Malmisanij, *Ferhengê Dimilkî-Tirkî*, Deng Yayınları, İstanbul 1992
- Milliyet Yayınları. Büyük Sözlük. Almanca-Türkçe, İstanbul 1990
- Redhouse, *İngilizce-Türkçe Redhouse Sözlüğü*, Redhouse Yayınevi, İstanbul 1986
- Redhouse, *Türkçe - İngilizce Redhouse Sözlüğü*, Redhouse Yayınevi, İstanbul 1986
- Kemal Sido-Kurdaxi, *Sprachführer Kurdisch*, Blaue Hörner Verlag, Marburg 1994
- P. van Sterkenburg, J. J. Pijnenburg, *Groot Woordenboek van Hedendaags Nederlands*, Van Dale Lexicografie, Utrecht 1984
- ТДК. Türkçe Sözlük (cilt.1.11). Türk Dil Kurumu Yayınları. Ankara 1988
- Torî, Ferheng Kurdî-Tirkî / Türkçe-Kürtçe, Koral Yayınları, İstanbul, 1992
- Süleyman Uludağ, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Marifet Yayınları, İstanbul 1995
- B. B. Usso, J. Salzer, *Lehrbuch der kurdischen Sprache*, Weşanên Instîtuya Kurdî, Berlin 1994
- J. de Vries, F. de Tollenaere, *Etymologisch woordenboek*, Het Spectrum, Utrecht 1983
- Wolters' *Mini-Handwoordenboek Turks-Nederlands / Nederlands-Turks*, Wolters-Noordhoff, Groningen 1992
- Petra Wurzel, *Rojbaş Einführung in die Kurdische Spache*, Ludwig Reichert Verlag, Wiesbaden 1997
- Abdullah Yeğîn, *Osmanlıca-Türkçe Yeni Lugat*, Hizmet Vakfı Yayınları, İstanbul 1992
- Ute E. Zimmer, A. Handel, *Dieren- en plantengids voor onderweg: familienatuurgids*, Tirion, Baarn 1990

Gebruikte afkortingen / Kurtebêjan

aanw.vnw.	aanwijzend voornaamwoord	rengdêrên îşarkî
aandr.	aardrijkskunde, aardrijkskundig	coxrafî
achterv.	achtervoegsel	paşdank
anat.	anatomie, anatomisch	anatômî
astron.	astronomie, astronomisch	astronomî
bep.vnw.	bepaald voornaamwoord	pronavê binavkirî
bijw.	bijwoord	rengpîşe
biol.	biologie, biologisch	bîolojî
bn.	bijvoeglijk naamwoord	rengdêr
chem.	chemie, chemisch	kîmyayî
dierk.	dierkunde, dierkundig	zoolojî
fig.	figuurlijk	mecazî
gramm.	grammatica, grammaticaal	gramerî
hoofdtelw.	hoofdtelwoord	hejmar
hulpww.	hulpwerkwoord	lêkera arîkar
jur.	juridisch	dadî
m.	mannelijk	mêr
med.	medisch	bijjîkî
mil.	militair	leşkerî
muz.	muziek, muzikaal	muzîk

nat.	natuurkunde, natuurkundig	fîzîk
onbep.vnw.	onbepaald voornaamwoord	pronavê nebinavkirî
onz.	onzijdig	bêcîns
pers.vnw.	persoonlijk voornaamwoord	pronavê kesîn
plantk.	plantkunde, plantkundig	botanîk
rangtelw.	rangtelwoord	hêjmarê rêzê
S.	Sorani (Koerdisch dialect)	Soranî
telw.	telwoord	hêjmar
tussenw.	tussenwerpsel	bang
uitr.	uitroep	bang
voegw.	voegwoord	gihanek
voorv.	voorvoegsel	pêşdank
voorz.	voorzetsel	daçek
vr.vnw.	vragend voornaamwoord	pronavê pirsyarkî
wederk.vnw.	wederkerig voornaamwoord	pronavê hevudu
wederk.ww.	wederkerend werkwoord	lêkerê pronavkî
wisk.	wiskunde, wiskundig	matematîk
ww.	werkwoord	lêker
Z.	Zazaki (Koerdisch dialect)	Zazakî
zn.	zelfstandig naamwoord	nav

Ji dê û bavê me re / Aan onze ouders